

# Zimanê yekgirtî

Îbrahîm Remezan



## Pêşgotinek kurt.

Sala 1926-ê.z. biryar hate dan ku Kurdistan a başûr(Lîwa Mûsil) bi Îraqê ve bihê girêdan. Sala 1932-êz. biryar ji (Desteka miletan)derkevt ku kargêr û fermanber hemû kurd bin û xwandin li dibistanan bi kurdî be. Ev biryar e li neteweyîyên Ereb ew ên li gel şah Feyselî hatin ji Sûriyê wek; Sati elhesrî û Samî Şewket û hevalên wan yên Îraqî. Îna li hev kombûn û biryar dan, ku kurdên devera Mûsil bi zimanî ve bikin ereb û kurdên Kerkûkê bi zimanî ve bikin Turkuman.

Dema hat pirsîn dê çawa ev e çê bibe? Îna gotin, „ Em rênadin kurdên devera Mûsilê bi kurdî bixwînin û heçî xortê kurd yê bihê jinê, em dê

kiçkek ereb lê marebikin. Li Kerkûkê, em dê karbidest û qaid firqeyî bikin Turkuman û dê bibêjin wan, çu kesê ne êxin karên mîrî heker xwe fêrî turkumanî ne be. Li perlemanî nûnerê şêxanê got, „ Em li Badînan bi zimanê kurdî naxwînin, em dê bi zimanê Qurana şerîf xwînin,,.

Li şah Feyselî û neteweyan, gotina wî xeşhat, îna şah Feysel cubeyekî erebî avêt ser milê wî nûnerî wek xelat.

Em kurdên devera Mûsilê ji xandina kurdî mayin bê behr. Lê birayên me li Silêmaniyê û Hewlêrê, bi kurdî xwandin. Sala 1960-ê Dr Siddîq Etrûşî, wî demî kargêrekî mezin bû li wizareta perwerdeyê, biryar derkir ku kurdên devera Mûsil bi kurdî bixwînin. Îna

piştî bênvedana nîva salê, kurdî li 179 dibistanên seretayî, navendî û amadeyî, hat xwandinê. Li waneya êkê hemû wate bi kurdî bihên xwandinê û li waneyên din, du wane rojê bihên xwandinê.

Piştî Beisî hatin ser desthelatê, kurdî li gekek dibistanan qedexekir.

Ev pitir e ji 80-ê salan kurdên Silêmaniyê û Hewlêrê bi kurdî dixwînin. Gelek rêzmanzan bo pêşvebirina zimanî peydabûn; lê mixabin ewan, kurdî ji rêza

Hindûewropî ladan bo rêzên Erebi û Turkî. Wek:

1. Rist e bi zimanên hindûewropî bi navî; yan cînavî dest pê dike, ewan risteyên bi karî(verb) dest pê dikirin wek:

R o y i ş t i m b o b a z a r .  
Suwarbûm le hesp. Çûm bo seyran.

2. Rist e bi berkarî(object) dest pê kirin wek Turkan:

Nanim xward. Awim xwardewe. Mangim bînî.

( Turk dibêjin: Êkmek yedim.)

3. Zimanê cadeyê kirin zimanê edebî, bi guhorîna pîta (d) bi (e). Wek:

Derom, dexom, deçim, bûn

Erom, exum, eçim.

4. Pîta (G) kirin (W). Wek: Got bû wot. Gotin bû wotin.

5. Nihad û guzare û tewawkerê nihadî û tewawkerê guzareyî

(elmusned, wel musned ileyhî wel mutemim)kirin di rêzmanan kurdî da. Ev ne rêza zimanê kurdî ye. Kurdan du rêz bo dariştin a risteyan hene.

A) kara+ berkar+ kar+ hoker(awilkar), heker kar (verb) têper be.

a) Wek:

Nizarî rez firot duhî.

Sînemê gul avdan pêr.

Wî xaniyek ava kir par.

b) Heker kar(verb) têneper be. Ew jî du rêz in:

1. Kara + kar.

Ez nivistim.

Bijar hat.

Gulê revî

2. Kara + kar + berkarê bi yarîde + hoker(awilkar).

Salar suyarbû li hespî betra pêr.

Sînem nivist li ser banî şevê dî.

6. Cînavên likaw kirin di zimanê kurdî da. Di zimanên hindûewropî da nîn in.

7. kirin, birin, helbijartin. Kirin:

kirdin, birdin, helbijardin.

Ew ne durist in bo ?

Kirin riha wê (k) e. Daxwaz dê be: bike. Niha dê be: dike.

Kirdin riha wê (kir) e. Daxwaz dê be: bikire. Niha dê be dikire. kurd wenabêjin. Birin jî wek kirinê durist e. Birdin ne duriste.

Helbijartin riha wê helbijêr e. Helbjardin riha wê helbjîr e. Helbijêr duriste ne helbijîr.

Vêca bo zimanê yekgirtî , bi dîtina min, divê Badînî bi kirmancî bixwînîn nêzikî deh sala û soraniyê jî bixwînîn û soran li gel soraniyê, kirmancî ji bixwînîn. Da bihê zanîn ka çine kospeyên di rêya zimanê yekgirtî da. Me pê xweşe, ku zimanê mîdyayê bi soranî be, heta zimanê yekgirtî çê bibe. Heker rast e me zimanê yekgirtî divê. Pêşniyaza min bo kurdên dilsoj, kurdên bakûr, kurdên Sûriyê, kurdên Ermenistanê û kurdên Rosiya, nizanin bi

pîtên erebî bixwînîn û binivîsin, vêca ez dibînim ku:

1. Elîfbêyek kurdî bi pîtên latînî ji layê rêzmanzanên dilsoj ve bihê danan û li hemû dibistanên herêmê bihê xwandin û li hemû qonax û hemû waneyan heftiyê çar wane bin.

2. Pirtûkên bi soranî, di salên borî da, hatîn nivîsîn gelek in û li ser hemû babetan in. Çend xweşe ew pirtûk bi pîtên latînî bihên nivîsîn da kurdên bakûr bixwînîn û sûdê jê wergirin û fêrî soranî jî bibin.

3. Gelî nivîskar, rewşenbîr û zanayên hêja, çend xweşe hemû kurd bi pîtên latînî fêrî zimanê kurdî bibin , çiku dê hemû kurdên cîhanê şên rojname û govarên li herêmê derdiçin bixwînîn û sûdê jê wergirin û fêrî soranî jî bibin.

4. Turkiya glek sûd ji latînîkirina turkî wergirt û nexwîndewarî lê nema.

